

# Seyr e Lê Rast e!



Ew goya (tepe) her du tîmên îtalîya û Frensa yarîya di wî mahîyê ya cama cîhanî ya futbolê pê kirî, bi dû milyon û çar sed hizar dolaran ji layê şêxekê qeterî ve hate kirîn.

Di leşê zarokekî da (300) hestî hene. Di yê mezinekî da bi tenê (206) hestî hene. Egera vê çendê jî ewe dema zarok mezin dibît hestîyên wî werarê diken û digehîne êk ji ber hindê jimareya wan kêmtir lê dihêt.



Hêka dînasorekê (12) mêtran bilind û (30) mêtran dirêj, bi tenê pênc caran ji hêka mirîşkekê mezintir bû. Ronkirina zanistî bo vê çendê ewe ku eger hêka wê ya mezin ba da qelpê wê jî yê sitûr û req bît û hîngê çîçeloka wê nedişîya jê derkevît.



Payrostîn navê vê belatînka şevê ye ya ku hîn di vî wêneyî da dibînin. Xwarin û vexwarina vê belatînkê rondikin. Ew dadde te bi berçavên çêl û gamêşan ve. Limbiwîsa xwe dirêjî çavên wan diket û rondikên wan dimêjît bêy ku çavên wan bêşînît yan zîyanekê bigehînitê.



Gundîyekê tonsê serê çêla xwe girt û bire bajêrî bifroşît. Piştî gehiştîne bazarî û bikir li dor kom bûn û sehkirînê ji nişkekê ve qoçek li xudanê xwe da û kete ser kelexê wî bi sim û pêna heta înaye ber mirinê.

Xelkî xwudanê çêlê bi zorî ji bin dest û pên çêlê îna der û bi nexweşxaneyê ra gehand. Xelkî xwudanê çêlê bi zorî ji bin dest û pên çêlê îna der û bi nexweşxaneyê ra gehand.